Gotarên Mêyane

Tirîfe Doskî

Bo min wek Terîfe helbestvan pitirtirîn pirs ev sale min ji xwe kirî û hizir tê de kirî, aya rewşenbîrî çi ye? Ez û dewrûber û çend rewşenbîrin. Em wek takek serbixwe bê nasnama nivîsînê, aya helbestevanî, yan romannivîsî, yan rexnegirî çend dişên di takegeriya xwe de zal bibin û xema me çend nivîsîne, aya em dinivîsîn ji ber ku me divê xizmeta rewşenbîriya kurdî bikin û devera xwe pêş bibin, yan me divê binivîsin û bê hîç armancên serekî me hebin, yan çi li pişt nivîsînê de ye. Em bo çi dinivîsin?

Yekem pirs berî bizanim bo çî me divê binivîsin, diviya bipirsin em kîne? Û bi ser çi mîjûyekî ve ne? Eve me dizivirîne rihe û rîşalên me wek beşek ji komelgeha mezintir û xaleka me dibe ser kulturê wê komelgehê, kulturê rewşenbîriye. Dema em kultura xwe nas bikin û xala em li ser rawestiyane, me destnîşan kir hingî dizanin dem çend giringe, da em xewnên xwe bizanin wek nivîsîn em çend dişên cihbicih bikin. Û li astê xewneka mezintir hizir bikin û di astê herêmeka seqamgîr de nerawestin. Belê, aya xema me nivîsîne? Rewşenbîr ji ber berpirsekî hikumî pitir berpirse ji layenekî û dozekî ew jî rewşenbîriya wî miletî ye. Berpirsatî beramber (ewî dî), berpirsatî beramber (zimanî), berpirsatî beramber (astê hoşyariya xelkê). Belê dîsan dibêjim pirs eve ye xema kê ye nivîsîn? Xema kê



ye gihurîn? Çend pirs dihêne kirin, hind bersiv diviya hebin. Belê pirs, bila zortirbin, ji ber ku em kêm pirs dikin, ewa evro li komelgeha kurdî de rû dide li ser astî rewşenbîrî, bi taybetî li bajarî me, ne li astê xwasta me ye. Di hizra me de nivîsîn berpirsatî nebûye, lew astê hizirkirinê bi vî awayî sade û rohin û bê perde ye. Eva evro li nava rewşenbîra kurdî de heye, berzebûna nasnama nivîsînê ye. Ji ber ku, li gor rûdanan gotara rewşenbîrî kême. Rewşenbîrên me di bazineka hemahengî de dizivire di navbera dezgehekî û hizbekî wek mada gehandinê lê hatiye bo du giropan, di nivîsînê de. Mirov diviya nûneratiya xwe bike beriya nûneratiya dezgehekî bike. Eve ne herşeyeka sivike li ser karmendên li dam û dezgehan kar dikin, belku hizreke, diviya em hizir bikin me bo çi tirs ji gotara rast û li gor rûdanan heye. Nivîsîn berî ku arezu pirkirina hezên hizirî be berpirsatîyeka mezine û her peyvekî baca xwe heye û peyva ne di cih û zemanê xwe de, rewşenbîrî ji mirovayetî betal dike ji ber rastgoyiyê, û wijdan û hestkirin, biryar, aştîxwazî, helwîst, hemû xesletên rewşenbîrane, lewma pêwiste berî nivîsînê em hizir bikin ku ev nivîsîne bo kêye û dê çi bigehîne?